

## Komîsyona tengahiyê çî ye?

Komîsyona tengahiya Niedersachsen endama şewirmendiyê ya Wezîrê Karên Hundir e bi kesatiyên gelemperî (di nav de ji bawermendan, şaredar, yêkêtiyan, aborî û bijîşkî). Ev ji bo hemû tengahiyên yên biyaniyan ku li Niedersachsen dijin berpirsyar e.

Komîsyona tengahiyê sedemên taybetiyê tengahiyên şexsî ku ji ber bi dawî hatina îqame tên çêbûnê tehlîl dike.

Heke komîsyon dozeka tengahiyekî qebûl bike, ev daxwaziyê tengahiyê Wezîrê Karên Hundir re tê dayîn. Wezîrê Hundir piştî li ser pêşkêşkirina îqame ji ber sedemên tengahiyê biryar dide (§23 ya Qanûna Îqame).

## Kî dikare daxwaziya dozeka tengahiyê bike?

Bîyaniyên ku bi zor dibe derkevin an tî derşinorkirin, dikarin daxwaziyek ji Komîsyona tengahiyê re bişînin eger derkirina wan ji ber sebebên şexsî an mirovaniyê pêwîst be.

## Sedemên tengahiyê kengî dikarin mewcûd bin?

Girîngiyêke taybet bi lêkolîna sedemên tengahiyê, întegrasyona civakî, perwerdeyî û pîşeyî yên kesên an

malbatên ku hûkmê dersînorkirinê di civakê herêmê xwe de hene, heye.

Ji ber vê yekê, agahî û belgeyên ser van xalên jêrîn bi taybetî girîng e, wekî mînak:

- Dirêjafî ya îqame
- Zarokxane û dibistanê zarokan
- Perwerdeya pîşeyî û xwendin û hêvojkarî
- Kar
- Çalaki di nav civak û yêkêtiyan de
- Xizmetên dilxwaz
- Têkiliyên civakî û malbatî u çavkanî
- Zanîna zimanê Almanî

ji aliyê dibistan, yêkêfî, cîranan, û şîrîkan piştgiriya vê daxwaziyê bê kirin.

## Ji bo astengiyên yên dersînorkirinê ji welatê lêkolîn nîne

Komîsyona tengahiyê ne berpirsyar e ji bo lêkolîna pirsgirêk û xeterên çêbûyî di welatê de. Ev erkê Dezgeha Feder-

al yê Koçberî û Penaberan û dadgeha îdarî ye.

## Pêvajoyên nivîskî

Tevahiya pêvajoya tengahiyê di nivîsinê de çê bibe. Ji ber vê yekê, sebebên divê bi berfirehî, bi serê xwe û bi zelalî werin pêşkêş kirin.

## Ajanan dikarin alîkarî bikin

Biyaniyên bandorlêkirî dikarin daxwaziyê tengahiyê bi kesên bi bawer bihêz bikin. Ajan û kesên bi bawer nikaribû parêzer bin, lê ji aliyê navendên şewirmendiyê, ji aliyê hevalên xwe û kesên bi bawer û dilsozên din, daxwazî yên xwe ji Komîsyona tengahiyê bişînin.

## Kengî daxwaziya tengahiyê ne mimkin e?

Li gorî § 5 a Rêzîknameya Komîsyona tengahiyê ya Niedersachsen (NHärteKVO) daxwaziyek nayê qebûl kirin, eger

- kesê biyanî di herêma Federal de nişteçî ne be an jî cihê mayîn naskirî ne be,

- Kesên biyanî, bi kêmanî 18 heyvan di herêma Federal nişteçî ne be,

- dema ku sûçên giran hene ku kevîn ninin, demên dersînorkirinê hatin diyarkirin an demên diyarkirî derbas bûne, Rêzîknameyê taybetî ji ber sedemên ne-qebûlkirinê tên dîtinê di § 5 NHärteKVO.

## **Li kî derê daxwaziyê tengahiyê tê şandinê?**

Daxwaziyê tengasiyê dikare bi endamê Komîsyona tengahiyê an jî ji bo nivîsgeha Wezareta Hundir ya Niedersachsen re bê şandin.

Navnîşana endaman dikare were dîtin li [www.hfk.niedersachsen.de](http://www.hfk.niedersachsen.de).

Li ser vê rûpelê, Rêzîknameya Komîsyonê û form û belgeyên rêberî jî ji bo daxwaziyê bên daxistin.

Ji bo agahiyên zêdetir, ji kerema xwe navnîşana jêrî ziyaret bike

**Nivîsgeha Komîsyona tengahiyê li Wezareta Hundir û Sporê ya Niedersachsen**

**Lavesallee 6  
30169 Hannover.**

Pêşniyara me ew e ku berî şandina daxwaziyekî agahî yê baş kombikin û an jî bi birêveber û berpirsyarên navenda biyaniyan û/an jî navenda Şewra koçberiyê axaftin çê bikin û agahî bistînin.

**Nivîsgeha  
Komîsyona tengahiyê  
Li Wezareta Hundir û Sporê  
Ya Niedersachsen**

**Hat ragihandin**

**Agahî li ser  
Daxwaziyê tengahiyê  
ji  
Komîsyona tengahiyê**

# **Niedersachsen**



## **Niedersachsen**